SERPÊHATIYA ALAN

Dr. Zara Berhîm / Qamişlo

Êvarî bi şev Alan kete taya xwede ji ber ku cara yekemîn wê dûrî mal bikevê. Diya wî hinek firax û hûremûr jêre hazir kirin, bo bi xwere bibê bajarê Helebê cihê xwendina wî ya nû li zankoyê.

Roja din tevlî hevalê xwe berê xwe dane Helebê bi basa Diclê, gihane geracê, dostekî way kevin li pêşiya wan bû û ew birin cem xwe ta ku xanîkî bi kirê bibînin.

Alan mabû dilihay ji mezinbûna vî bajarî û lê mijûl dibû û digot gelo çima li bajarê me jî weke Qamişlo ev zanko nînin!!! Ma qey wilqasî biwan girane ku ji mere jî înstîtût û zankoya avakin!!! Çima emê van astengiya bibîn bonî xwendinê!! mane cihê mejî cihekî zengîne û hemû tişt lê hene, ji neftê bigre ta genim û pembû û gelek tiştên din!!! mane gereke ku xwendinê ji mere hesanî bikin!! yan me dibînin tenê Çêleka şîr!!!

Bi van pirs û ramanan Alan roja xwey pêşî derbas kir ta sibha din berê xwe dane zankoyê bonî pelkê xwe li wir xelas kin. Pistî ger û westandineke baş karê xwe birne serî û ji wir yekser ew hevalên xwe çûne darî xaniyekî. Xanî dîtin û kete serê wan, her çaran bihevre standin.

Ji bonî ku bajêr qenc naskin, Alan û hevalê xwe piştî nîvro sikak û tarkê bajêr tevûlev didan, lê helbet wan gelekî bêrya malê dikirin, û Alan bixwe têlêfon ji wan qut nedikir, û hin

caran diçû, nexasim vê salê pişti bûyerên Qamişlo û serhildana kurda,. êdî gelek xortên kurd dûrî Bajarê qutabiyan kirin û oda nedane wan.

Carekê Alan vedigerê mal, li basa hindrê bajêr siwar hat, pilêta xwe qut kir û rûnişt, dîtna ku dît ku va terqênî bi basê ket û xelk ketne hevde û hina ji wan dixwest xwe dipencerê re bavêjin, hemû bonî mêrkê kontrol bû, yê ku li pilêta digeriya Mêrik giha cem Alan û daxwaza pilêtê lê kir.

Alan pişta wî raste û bi mêranî pilêt şanî kir, lê mêrik gotiyê ku ev pilêt kevne û divê tu mixalefê bidê. Alan jêre got ku pilêta wî nû ye û ew derewa nakê.

Piştî danûstandineke dirêj, Alan pere dane mêrik, lê peyre ji zilamê rex xwe rûniştî doza pilêtê kir, li nemra wê nerî, dît ku herdû yek nemrene dicîde yek nekire dido û berê xwe da mêrik. Giha cem, pilêt şanî kirin, gotiyê ku ev herdû pilêt nemrê wan yekin, te çima ev neheqî li min kir!! De rabe zû perê min li min vegerêne, ji ber ku te bêbextî li min kir. Mêrik ne xwest baweriyê bi gotinê alan bînê û dîse guh nedayê û gotiyê ku ev leystik û xap gelek caran diser wîre derbas bûne û ji ya xwe nehete xwarê. Alan bi xweşkayî jere got ku ew derewa nakê, çiku kurde û ji Cezirêye û ne helebiye xwediyê xap û vira ye.

Gava peyva kurd û Qamişlo kete guhê vî zilamê nijadperest, bû weke Gurekî birçî û har, pêre pêre çavê wî sor bûn û destpêkir: Naxwe tu kurdî!! ha ha mane winin ku we ev welat wêran kiriye!!! Hemî teşqele û êş ji dûv we tên!! Çi bê serê we diheqê wede ye, ez bi xwe ji we hez nakim û eger tu rast jî bêjê tiştekî te li cem min nîne û çi bi destê teve werê bike.

Di wê kêlîkê de Alan bû yekî serxweş, dinya li ber çavê wî reş bû, bû kutkuta dilê wî pêre Adrênalîn dixwîna wî de bilind bû, tiştek li pêşiyê xuyanekir, lê bihnekê dinavre dilê wî pê şewitî wek kurd bê çiqas zilm û bêbextî tê serê wan, lê herûher wan gunehkar dibînin.

Vê çirûska hay sawî hêzeke xurt berda canê wî û heta xwedê himet dayê kulmek li mêrik xist, ew li hindirê basê diorêj kir û xwe avête ser wî, lê xelkê ew jinav lepê wî xelas kir, lê kela wî hê hînik nebûbû û dixwest bêtir Iêxê. Alan xwe dît gava wî dinav lepê komek polîsan de ye, piştî ku şifêr bas sekinandibû û berê wan dane mexferê, lê birêde Alan pê dihesiya ku hinek tep ji piştve lê dikevin ta ku gihan hindirê oda serokê polîsan.

Alan û yê pelêner derbasî hindir bûn, serokê polîsan li wan nerî û bêtirîn Alan, çiku gelek qerebalix û gotin digotin bi dengekî bilind û zimanekî erebî şikestî û di navre hin sixêfên bi kurmancî jî dikirin wan. Alan dicîde doza mafê xwe ji yê serok xwest û çima ev bêbextiya han anîne serê wî!!! Zilamê dinav sala de çûyî bi bêhneke fereh li herdiwan guhdarî kir, çîrok baş naskir, rabû gote mêrkê helebî ku divê tu perê vî xortî lêvegerênê. Mêrik bêçare ma û perê Alan danê, lê Alan biwê kela gerim ew pere go vir û dipencerê re avêtin û ji mêrkê pelêner yê helebî re got: Kula min ne pere bûn lê belê bêbextî tucarî qebûl nakim

û da ku tu zanibê ku kurd mirovin rastin û doza wekheviyê dikin û bivî tiştî tên naskirin. Peyre serokpolîs berda mêrkê helebî lê Alan hinekî li cem xwe hişt û gotiyê ma vêga tu negihay mafê xwe!! Alan jêre serê xwe hejand û gotiyê ku gava wî anîn cem polîs, bi-rêde hineka tep lêdixistin û doza heqê xwe li wan dikê. Serokpolîs hemî esker komkirin û ji wan got ku divê hun hişkerekin bê kî ji we li vî xortî xistiye!! Piştî qerebalixeke baş dizê xwe naskirin, serok ew daber şeqama û berdayê. Bihna Alan hinekî fereh bû, serok-polîs destûra wî neda û xwest hin pirs jê bikê:

Naxwe tu ji Qamişloyî, berî bêtirî deh salan ez li bajarê Amûdê serokê polîsan bûm, bi rastî qenciyên we gelek li mi hene û ev rewşa minî baş ya ku niha ez têdeme ji wê dana xelkê cizîrê bû, ta niha hîn jî ez çandiniyê li wan deveran dikim û tu carî ez wan camêran jibîr nakim, û gotina xwe berdewam kir û ji Alan pirs kir sedemê hatna wî ya vî bajarî, Alan jêre got ku ew li zankoyê dixwênê. Dîsa zilam kêfa xwe daxuyakirin di aliyê Alan de û got ku hun kurd ne weke erebane, we riya xwendinê neberda tevlî cihê weyî dûr. bonî wilo ez gelekî rûmeta xelkê we digirim, ji ber ku berî niha ez bixwe diwê baweriyê de bûm ku kurd miletekî gelekî paşketiye, lê gava min bi çavê xwe her tişt dît êdî nerîna min hate guhertin û niha ez pir poşmanim ku ez ji cem we avêtme vî bajarî.

Alan li ser êgir bû û dixwest zû birêkevê, lê zilam rê nedayê û weke ku tiştekî xwe bibînê û bawer nekê û bi dilekî şewat û keser ne kûr gotinê xwe berdewam dikirin.

Bi germbûneke xurt mêrik destûra Alan da û jêre alîkarî û dilxuaziya xwe pêşkêş kir û gotyê, ku herûher ew amadeye ji bo xizmetê û bi çi rengî bê!! Alan xatir jê xwest û berê xwe da mal.

Hêdî hêdî Alan dimeşê, weke ku ji xweneke nexweş rabê,. ev bûyerên ku pêre der-basbûn di serê xwede dibê û tênê, lê dikê û nakê ber nakevê û weke ku kevirek di ser dilê wîde ye, mêjiyê wî nikarê bersiva wan pirsên ku di serê wîde dizîvirin dibê!!!

Gelo çima ev kîn û hestên şofînî li cem hina peyda dibon!! Li alîkî din ji xwere digot ku hinek şensê wî divirde hebû ku li yekî şîr helal rast hat, naxwe wê rewşa wî gelekî pîs bûba û xwedê zanê wê dikûve derxistibane û çi felek wê hatiba serê wî, çiku gelek teşqelê hatine serê kurdan bê ku zanibin çima û ji bo çi!!!

Alan carkê xwe dî ku va gihaye malê, bilez derbasî oda xwe bû û tiştek wê şevê ji hevalê xwere negot, ta roja din piştî ku hemiyan bela xwe jê nevekirin, çiku halê wî ne baş bû, êdî nema karîbû ji ber wan veşêrê. Çîrok tevde ji wanre got, hinekî pêre pêre bêhna wî pê fereh bû, lê ji nûvre hişiyarî hin tiştên nû bû û bi çavekî din vê AAAAAA li her tiştî dinêrî!!!!